Asklepîos û Serpens-Mar

Silêman Demir
silemand@yahoo.se



Asklepîos, piştî bavê xwe xweda Apollon, doktorê dinyê yê herî pêşî ye. Ew îro li ezmên stêrik e.

Li gora mîtolojiya Yûnanî demekê ji deman dotmîreke dinyayî ya spehî bi navê Koronîs heye. Xweda Apollon wê dibîne û dil dikeve wê. Apollon wê ji xwe re tîne, lê ne dereng tê digihije ku nikare bi wê bawer bibe û pişta xwe bide wê. Tê derdixe ku hema gava pişta xwe dide wê, ew wî dixapîne, zilamên din dike mêvanê xwe û wan dixe himbêza xwe.

Apollon di rêyekê difikire û rojekê qirakekê-qelereşkekê (bi latînî: Corvus corax) li ber wê datîne, wê şîret dike, jê dixwaze ku li Koronîs raçav bibe bê gava ew ne li malê ye çi dike û diçe.

Qelereşk heywana Apollon ya bijarte û yek ji xizmetkarên wî ye. Qelereşk, li gora emrê ku Apollon dide wê, li hemberî deriyê Koronîs vedikeve û li wê raçav dibe. Gava mêvanê wê tê, ew difire û diçe wê yekê ji Apollon re dibêje. Apollon hema radibe, bi lez û xezeb vedigere malê û Koronîsê dikuje. Lê piştî dikuje, dîbîne ku ew avis ê. Apollon radibe nava wê vedike û dibîne ku lawek di nava wê de ye û gelekî spehî ye. Apollon wî derdixe, navê wî dike Asklepîos, wî bi xwe re dibe û wî li gora dilê xwe û bi ilmê mezin û perwerde dike. Wî bi bingehîn fêrî ilmê doktoriyê dike. Apollon, xwedayê doktoriyê, helbestvaniyê, sazbendiyê û evsûniyê ye.

Gava Asklepîos dibe xort û xwendevan, demekê jî diçê li ber destê Kentaurê navdar Chiron perwerde dibe. Asklepîos, ji Chîron, di ber doktoriyê re, fêrî egîtiyê û dilovaniyê dibe. Êdî gelekî ji ilmê xwe hez dike û xurt dike.

Asklepîos, wilo him dibe xwedayê rehetkirinê û doktoriyê û him jî dibe

egîtekî navdar ê dema xwe. Gava egîtên Yûnaniyan ên wek Jason, Peleus, Herakles, Castor û Pollux bi keştiya Argo derdikevin sefera anîna çermê beranê zêrînî ji pişt çiyayê Kaf, ew dibe doktorê wan û bi wan re diçe.

Gava Asklepîos dîsa vedigere Yûnanistanê, îcarê bala xwe bi temamî dide karê xwe. Doktoriyeke nedîtî û nebihîstî dike. Kêfa xweda bîrewer û avakir Athena gelekî ji kirin û biserketinên wî re tê. Gava Perseus serê Medusa jê dike, Athena hinek xwîna ku ji stûyê wê diherike, dibe û dide Asklepîos. Ew xwîn dermanekî nedîtî ye. Doktorekî wek wî dikare miriyan jî pê rake. Asklepîos radibe dermanên wilo ji wê xwînê çêdike û nema dihêle ku xelk bimirin û êdî dest pê dike û miriyan radike. Hades, xwedayê welatê mirinê ji ber wê kirina wî diçe giliyê wî li ber Zeus dike; dibêje, ne bes e ku nahêle tu kes bimirin û bên welatê mirinê, êdî miriyan jî radike û dibe, ev çi yek e.

Gava Zeus tê difikire, dibîne û ditirse ku wê bi kirina Asklepîos, dar û rêzberiya dinyê xerab bibe, wê xweda bêqedir bibin, wê Asklepîos û mirov ji bin darê karîna wî derkevin. Radibe birûskekê li Asklepîos dixe û wî dikuje.

Ew yek, gelekî zora bavê wî Apollon diçe. Dixwaze here heyfa lawê xwe hilîne, lê nikare li ber Zeusê ku mêrxweda ye û bavê wî bi xwe ye rabe, destê xwe li wî hilnade, ji xwe tiştekî wilo nabe. Apollon diçe wek heyf, Cyklopan dikuje. Ew, hûtên gelekî mezin û bi çavekî tenê ne, di eniya wan de ye. Ji ber ku Cyklop di bin çiyayê Etna de brûskan ji Zeus re çê dikin, ew jî sucdar in, Apollon diçe wan.

Zeus, gelekî li ser wan dixeyide. Apollon ji ber wê kirina wî ji Qesra Olympê ko li serê çiyayê Olympos e der dike û wî ji xwedatiyê derdixe. Apollon deh salan nîvbirçî û nîvtazî li deriyan dimîne, şivantî û gavantiya

xelkê dike. Zeus, piştî deh salan wî ji nû ve efû dike, xwedatiya wî dide wî û wî dihewîne Qesra Olympê.

Dihat bawerkirin ku Asklepîos jiyaneke malbatî a geş û xweş dijî. Her demê bi jina xwe û zarokên xwe re ye. Jina wî **Hepîone** ye. Du lawên wî jê hene. Podaleîrîus û Machaon. Herdu lawên wî jî dibin doktorên navdar. Herdu beşdarî şerê Troya dibin. Lê dîrok dîsa jî Machaon mezintir dide naskirin. Piştî bavê xwe, ew doktorê zemanê xwe yê herî navdar e. Navdariya wî, digihije heta dema me. Botanîkerê Swêdî, Lînné, navê wî li minminîkeke mezin kiriye. Jê re Papîlîo Machaon dibêje.

Pênc keçên Asklepîos hene. Navê wan, **Akeso, Iaso, Panakeîa, Aîgle û Hygîeîa** ne. Dudu ji wan gelekî navdar in: Hygîeîa ku tê maneya rehetbûnê, laşsaxiyê û a din jî bi navê Panakeîa ye, ku ew jî tê maneya a ku hemû rehetiyan dide. Lê dîsa jî Hygîeîa a herî navdar e. Ew xweda rehetiya psîkolojîk û fîzîkî ye. Gotina *hygîen, hygîene* ku îro di piraniya zimanên ewrûpayî de heye, ji navê wê tê.

Asklepîos piştî mirina xwe di ezmanê başûr de dibe koma stêrikan a bi navê Serpens ku bi latînî mar e. Ji xwe ew mar e tiştê ku îro jî nîşana ilmê doktoriyê ye. Komeke stêrikan bi navê qelereşkê jî di ezmanê başûr de heye.

Serpens, gava mirov li Hirçê binere, li hela destê çepê li hinekî jêrtir dikeve. Wek marekî dirêj e. Di binya Hercules û Ophiuchus re ye. Serek jê Serpens Caput e, ê din Serpens Cauda ye.

Romî ji Asklepîos re, **Aesculapius** dibêjin û rûmeteke mezin didin wî. Ji ber wilo heta vê derengê, li ba Romiyan mode ye ku ji doktoran re bibêjin Eskulap. Ji navê wî yê bi latînî tê.

Perestgeha Asklepîos a herî navdar li girava Kos e. Hîna dema antîk dibistaneke doktoriyê jî li wir tê vekirin. Tê gotin ku ew dibistana doktoriyê ya dinyê ya herî pêşî ye. Ilmê Asklepîos ê doktoriyê, di malbata wî de dimîne û her dom dike. Bav dide law û tê. **Hîppokrat** bi xwe jî ji wê malbatê ye û li wê dibistanê xwendiye.